

Ji raya giştî re eşkere ye kî dixwaze yekrêziya Kurdî biser nekeve

Kurdistan Cemal Ehmed



Qonaxa yekem ya danûstandinên di navbera Encûmena Niştîmanîya Kurdî li Sûriyê ENKS û Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD birêve çû, û li gor serkirdeyên

ENKS ev qonax baş birêve çûye, û niha tê çaverêkirin ku qonaxa duyem jî destpê bike, ENKS jî riya e li ser serxistina van danûstandinan. Mihemed Cuma

wiha li ser vê mijarê dibêje, gelê me li Kurdistana Sûriyê bi van nûçeyan gelekî kêfxweş e, lê car caran hin kes derdikevin û daxuyaniyên bê ser

û ber didin, dihêlin ku xelk bêzar bibe. Divê ev kes bê deng bibin û nebin sedema têkdana van danûstandinan. Lava Omer jî dibêje, ji raya giştî re eşkere ye kî

dixwaze yekrêziya Kurdî biser nekeve, berya niha jî li rêkeftinên Hewlêr1, Hewlêr2 û Duhokê me dît bê çawa PYD xwe ji rêkeftinan da alî û ew xal cîbicî

nekirin, berûvajî endam û aligirên ENKS girtin û hin ji wan dersînor jî kirin, vê carê gelekî hestiyar e û divê danûstandin biser kevin.

Rewşa welatîyên Kurdistana Sûriyê zehmetir dibe

Kurdistan-
Dîlan Omer

Di dema dawî de nîrxê lîreya Sûrî beramber Dolarê Emerîkî daketiye û gihîştîye asteke metirsîdar û êdî xelk rewşeke zehmet û dijwar derbas dîkin, û ji rewşa xwe ya niha jî gelekî bêzar in. Roj li pey rojê Dolarê Emerîkî beramber lîreya Sûrî buha dibe û ti çareserî jî ji vê pîrsgirêkê re nîne. Îmad Xidir welatîyekî bajarê Amûdê li ser vê mijarê wiha ji Rojnameya Kurdistan re dibêje: Niha bi daketina nîrxê lîreya Sûrî û buhabûna nîrxê Dolarê Emerîkî rewşa xelkê Kurdistana Sûriyê zehmet bûye, û niha nan li malê wan tine ye û bê pere û ji vê rewşê gelekî bêzar in û daxwaz dîkin ku çareserîyeke baş ji rewşa wan re bê peyda kirin, divê bi awayekî guncaw rêveberîya PYDê ku xwe kiriye desthilat çareserîyekê bibîne, û berya niha jî gelek soz dabû welatîyan û ti soz jî bi cih nekirye. Ez dikarim bibêjim ku niha karesateke mirovî li deverên Kurdî rû dide û ti kes û aliyek jê bi hawara wan ve nayê, divê desthilata Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê çareserîyeke bilez ji vê pîrsgirêkê re bibîne, û jiyan xelkê jî bike karên xwe yên herî sereke da ku ew ji karesatekê rizgar bike. Mihemed Elî ew jî li ser vê mijarê wiha dibêje: Encûmena Pîran a Emerîkî di meha Berçîleya 2019an de Yasaya Sîzer pejirandibû, yasaya Sîzer jî projeyê Emerîkî li dijî rêjîma Esed e, sizayan li ser her alî û kompanyayên Beşar Esed û hêzên wê yên serbazî û

karta enerjîyê bike bicih dike. Herwiha Divê herdu aliyên siyasî yên Kurdistan Sûriyê Encûmena Nîstîmaniay kurdî li Sûriyê ENKS û Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD daxwaz ji Emerîka bikin, ezmûna Iraq û Herêma Kurdistanê li Sûriyê jî bicih bikin, ku di wê demê siza li ser rêjîma Iraqê hebû, lê li Herêma Kurdistanê bernameya petrol ji bo xwarinê hebû. Heger Emerîka û civaka navdewletî

bernameyeke wiha li Kurdistana Sûriyê jî pêk bînin, dê rê li ber karesatên mirovî bigire, heger ec yek neçe serî dê rewş berev alozbûnê ve biçe û nema çareser jî dibe Jînda Mehmûd wiha dibêje, mûçeyên fermanberên Hikûmeta Esed, di navbera 40 hezar û 75 hezar lîreyan de ye. Mûçeyên fermanberên dezgehên Rêveberîya PYD jî di navbera 75 hezar û 200 hezar lîreyan de ye. Dahata mehane ya

karkerekî li derveyî dezgehên herdu aliyên, kêmtir ji 30 hezar lîreyan e. bi vî awayî, rêjeya hejariyê li Kurdistana Sûriyê gihîştîye 75%. Her tê pêşbînîkirin, ku di rojên bê de, pereyên Sûrî erzantir bibin, êdî rewş aloztir dibe, bi taybetî eger sizayên Yasaya Sîzer, ji aliyê Emerîkîyê ve, 17yê vê meha Hezîranê, weke ku tê pêşbînîkirin, bikevin warê cîbicîkirinê. Cemal Ebdula jî wiha li ser vê

mijarê nerîna xwe tîne, heger hat û rêveberîya PYDê herî kê mûçeyên karmendên li cem xwe bi dolar bide egere sivkatî li ser milê welatîyên Kurdistana Sûriyê çê bibe û êdî hinekî ji zehmetiyê rizgar bibin, bi rastî heger hat û sizaya sîzer were cîbicîkirin bi temamî dê abûriya Sûriyê wêran bibe û di nava de jî Kurdistana Sûriyê, divê Emerîka çareserîyekê ji vê rewşê re deyne û nihêle bandora van sizayan

li deverên Kurdî bibe, lê dê bi çi rengî were kirin ew jî nediyar e û helbet zehmet e ji ber ku serderîya xelkê bi pereyên Sûrî ye, lê heger bixwaze dikare bi çendîn şeweyan vê yekê bike û bandore li ser xelkê jî kê mûçeyên karmendên li cem xwe bi dolar bide egere sivkatî li ser milê welatîyên Kurdistana Sûriyê çê bibe û êdî hinekî ji zehmetiyê rizgar bibin, bi rastî heger hat û sizaya sîzer were cîbicîkirin bi temamî dê abûriya Sûriyê wêran bibe û di nava de jî Kurdistana Sûriyê, divê Emerîka çareserîyekê ji vê rewşê re deyne û nihêle bandora van sizayan wan baştîr dijîn, lê niha kar li herêma Kurdistanê jî kê mûçeyên karmendên li cem xwe bi dolar bide egere sivkatî li ser milê welatîyên Kurdistana Sûriyê çê bibe û êdî hinekî ji zehmetiyê rizgar bibin, bi rastî heger hat û sizaya sîzer were cîbicîkirin bi temamî dê abûriya Sûriyê wêran bibe û di nava de jî Kurdistana Sûriyê, divê Emerîka çareserîyekê ji vê rewşê re deyne û nihêle bandora van sizayan



Di bîreweriya 104 saliya Peymana Sykes-Picot de



Dr. Kamîran Haj Abdo

Guman di wê yekê de hîç nîne ku kurd yek ji kevintirîn gelên Rojhilata Navîn e. Tevî ku kurdan hemû mercên neteweyî di xwe de civandine jî, ew heya nuha bê dewlet û çarçeweke siyasî, ya ku tê de kari bin hebûn û taybetmendiyên xwe biparêzin û pêşve bibin, mane. Gelê kurd, yê ku ji hezar salan û vir de li ser xaka bav û kalên xwe dijî, roleke zor gewre di avakirin û pêşdebirina şaristaniya herêmê de listiye. Wî di xwe de hemû pêdivî û pêwîstiyên netewbûnê civandine: ew xwedî dîrok, ziman, xak, kelepûr û wijdaneke hevbeş e. Li gor hemû pîvan, peyman û biryarnameyên yasayî yên navneteweyî ew li ser xaka xwe ya dîrokî xwedî mafekî rewa ye, ku bi viyana xwe ya azad paşeroj û çarenûsa xwe destnîşan bike. Ango ew jî mîna hemû gelên cihanê, li gor yasa û zagonên navneteweyî, xwediyê mafê çarenûs e, ku di wê de, helbet, mafê damezrandina dewleteke kurdistanî ya serbixwe û yekgirtî jî heye. Lê mixabin rastî ew e ku kurd û welatê wan Kurdistan hîne jî di navbera çar dewletan de perçekirî ne. Cara pêşîn Kurdistan di encama lihevhatina Qesir-Şêrîn de, 17.05.1639, di navbera Împeratoriya Sefewî û Sultanişîna Osmanî de hate perçekirin. Piştî wê bi 277 salan

jî netewa kurd û Kurdistan careke din toşî perçekirinê hat. Vê carê jî li gor peyman Sykes-Picot (Saykês-Pîko), 16.05.1916, piştî Şerê Cîhanê yê Yekê bi ser çar dewletan de, ku ji wan sisê nû hîngê hatin avakirin (Sûriya, Îraq û Tirkîyê), hate dabeşkirin. Du tişt bala mera di vê pêvejoyê de dikşînin:


* Herdu lihevhatin (Qesir-Şêrîn û Sykes-Picot) di heyva Gulanê de ne;
* Peymana Sykes-Picot di demekê de hate meydanê ku tê de hetava mafê çarenûsiyê hildihat. Her di wê demê de serokê Dewletên Yekbûyî yên Amarîka Woodrow Wilson bîrdoza mafê çarenûsiyê di nexşeriya xwe ya aştîyê de (bernameya 14-xalî) bi nav kiri bû. Lê ji dêvla ku kurd kari bin di welatê xwe çarenûsa xwe bi viyaneke azad destnîşan bikin û welatê xwe bikin yek, ew hîn bêtir hatin perçekirin û bindestkirin. Bi perçekirina Kurdistan re paşeroj û çarenûsa gelê me li her perçakî kete bin destê rêjîmeke ji ya din şovenîtir û nijadperestir. Wan herçar dewletên dagirker, bi hemû şeweyên leşkerî, rêzanî, derûnî û hwd. hewil dan (û hîn jî hewil didin) ku miletê kurd ji holê rakin; kesayetiya wî ya taybet biperçiqînî û di çarçewa erebkirin, turkirin û fariskirinê de bipişêfin. Ji dest vê siyaseta hov û dirinde, ya şoven û nijadperest, gelê kurd ligel hemû sermiyanên xwe yên aborî, şaristanî û çandî toşî diwartirîn şer û êrişên tunekirinê bûye û hîn jî dibe, û ew, mixabin, li sedsala bîst û yekê - sedsala

azadî, demokrasi û wekheviyê hîn (Başûrê Kurdistanê ne tê de) ji seretayîtirîn mafê mirovî bêpar maye. Lê, li hember vê zor, stem û nedadmendiyê, li hember vê bindestî û çewsandinê gelê kurd çî li vir û çî li wir destgirêdayî nema; gelek şoreş, serhildan û raperîn pêk anîn û tu carî ji ya xwe nehat xwarê û dest ji xwe berneda. Helbet paşeroj ya azadî û mafên mirov û miletan e. Dûr an nêzik emê jî di siya azadî, demokrasi û wekheviyê de bi taybetmendiyên xwe yên netewî şa bibin, wan biparêzin û pêşve

bibin. Çunkî roj bi roj girîngî û pûtepêdaneke mezin bi mafên mirov û miletan tê dayîn û ew doza - doza mafên mirov û miletan - ne weke berê di çarçewa yasayên navxweyî û sînoren dewletan de dîl û çemberkirî ye. Vajî wê, ew bûye dozeke navnetewî ye giştî ku bi her mirovekî mijûl e û hemû mirov jî pê mijûl in. Vêca da ku em Kurd jî rojekê pêşde azadî û serbestiya xwe bi dest xînin, divê em xwe ji wê rojê re amade bikin da ku em kari bin sûd û kelkê ji guhartinên navnetewî werbigrin. Ev jî tenê bi vê yekê dibe: Piştî

evqas sal be jî em li yekîtiya xwe xwedî der kevin û wê biparêzin; berjewendiyên bilind yên miletê xwe di ser hertişteki din re bigrin; her gav bi hev re, bi yek dengî, biqîrin: Bijî Kurdayetî berî hertişteki din. Divê ji bîra me neçe çawa Xaniyê gewre berî bêtirî sêsed sal goti bû: "Ger yekîti nebe, ne dîn dimîne, ne jî dewlet." Di bîreweriya 104-saliya Peymana Sykes-Picot û 341-saliya lihevhatina Qesir-Şêrîn divê em kurd tev bi yek dengî biqêrin: na ji Sykes-Picot re, erê û hezar carî erê ji mafê çarenûsî re. Li

dawiyê dimîne ku em ji wan kesan re bêjim, yên ku dixwezînin bidin xuyakirin ku mafê çarenûsî mafekî kevneperest û ne serdem e, peyveke qelew û kevirekî giran e, yan jî erê mafekî pîroz e, lê hema ji Kurdan re na..., ku mafên çarenûsî îro roj ji hemû deman bêtir nîrx, pîrozî, rewabûn û mafdariya xwe daye çespandin. Ew di benda yekê ya herdu Peymanên Navneteweyî yên Mafên Mirovan de weke bingeha hemû mafên din yên mirovan hatiye binavkirin. Bijî Kurdayetî berî her tişteki din.





Konê Reş û dehemîn pirtûka helbestî bi navê (Qamişlo-Pol)

Cemşîd Bagokî- Qamişlo

Di dawiya heyva Gulana /2020an de, dehemîn diwana Konê Reş bi navê (Qamişlo-Pol: Helbest û Pexşan), bi çapeke taybet û xwemalî li Qamişlo hatiye çapkirin. Berî neh, sisê diwanên wî ji mezinan re bi navê: Welatî!: Beyrût/ 1998, Dergehê Jîn û Evînê:, Beyrût/ 2001 û Şîhîna Şevbuhêrkên Dîl: Duhokê/ 2010 hatine çapkirin û Sê diwanên wî ji zarokan re jî bi navê Sîpan û Jîn: Beyrût/ 1993, Şagirtê Bedirxan im, Beyrût/ 1996 û Helbestên Zarokan: Amed (Diyarbakir)/ 2013 hatine çapkirin. Digel ku Sê diwanên wî jî, ji zimanê Kurdî hatine wergerandin bo zimanê Erebi bi navê: Cûdî Çiyayê Mirada: wergerandina Hejar Îbrahîm, Şam/ 2004, Dara Çinarê: wergerandina Îmad Elhesen, Şam/ 2006 û Gurzek Êş: wergerandina Xalis Musewir, Qamişlo 2017, hatine çap û belavkirin.

Qamişlo-Pol: Komê helbest û pexşan in.. ji 222 rûpelan pêk tê. Bi pêşgotinek bedew ji rex mamoste Derwêşê Xalib ve hatiye nivîsandin, Lêveger û berg ji rex mamoste Ciwanê Evdal hatiye kirin, tabloya qabê ji rex hunermendê navdar Fuad Gemo ve hatiye çêkirin. Pirtûk bi çapeke taybet ji rex xwediye wê Konê Reş ve li Qamişlo di çapxaneyê Pêlla de hatiye çapkirin. Ji bo nanasîna vê pirtûkê ji gotinên mamoste Derwêşê Xalib ku di pêşgotinê de nivîsandine, xweştir nabînim: "Mirov çî kare di pêşgotina pirtûkekê de ji nivîskarekî mîna Konê Reş re binivîse, ku bi bûyer û rûdawên jiyane re pêlên coşa hestên wî radibin û bi hunera kela dilê xwe li ser pel radixîne. Bêguman piştîne û çarçeva vê huner û coşa dil, hevna serpihatiyên jiyana wî ne, bi taybetî ew qonaxên ku gorîna girang bi serde hatine. Ji destpêka pirtûka Konê Reş ya di destê we de, sernavê pirtûkê 'Qamişlo-Pol' bala mirov dikişîne. Wateya peyva "Pol" payetext e, ango wateya navê pirtûkê dibe "Qamişlo payetexta dilê min". Di helbest û pexşanên vê pirtûkê de diyar dibe çawa renc û azeriyên dilê xwe bi êş û kulên gelê Qamişlo ve di hûne, çawa rengên şahiya xwe tevli keskesora hêvî û omîdên belngaz û bindestan dike.. Konê Reş bi pêtên dilê xwe, gend û gemarê disoje, pak û temîz pêşkêş dike, bi hestên têr û zengîn, bi awirên tûj û dûrbîn, bi dilsoziyeke resen û avaker xemla hêviyên hejaran dike buxçikek û diyarî we dike. Ez naxwazim li ser naveroka pirtûkê rawestim, ne ji riwên wê yên hunerî û wêjeyî binirixînim, berî hemî ji bo ku xwendevan bi xwe bibe rexnegîrekî serbest.. Xwendevan dadwer e, ew xwediye biryara dawî ye".



Piransîpên Pêşmergeyatiyê di hemû jiyana xwe de pêk tîne

İdrîs Hiso-Gewilan

Enwer Hisên Kalo, ji sala 2014an ve, yek ji endamên Pêşmergeyên Roj e, berî çend salan ji ber cenga li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê qwimî, derbasî sînorê Başûrê Kurdistanê bû. Xwena Enwer bû ku ew di bin alaya Kurdistanê de bibe Pêşmerge, lewma dema bihîzt ku hêza Pêşmergeyên Roj hatiye damezirandin, Enwer jî yekser tevî vê hêzê bû da ku bergiriyê li welatê xwe bike. Bi tiwane û wireyekî berz Enwer tevî şerê li dijî DAIŞê li bereyên şer li Şingal, Zumar, Malih û Ên Iwês li dijê çete û terorîstên DAIŞê û Çeteyên Heşda Şeibî bû, û bergirî li welatê xwe kir. Enwer piransîpên Pêşmergeyatiyê di hemû jiyana xwe de bicih dike, di dema erkê xwe de ew li sengerê şer hilgirê tivinga xwe ye, di dema ku ew li malê be rojane li malekê ye, ji bo xizmetkirina welatîyên xwe. Ji filan re diwarekî ava dike, ji yê din re banê xaniyê wî çak dike, ji yê din re dîkorekî çêdike, heta derengî şev nazîvire mala xwe, ev hemû jî bêtî ku filsekî ji kesekî bistîne. Enwer ji Kurdistan re wisa behsa pêşmergeyatiya xwe dike: "Ez li Efrînê li Birc Evdalo berî bûyerên Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê di nav rêzên Partî de Pêşmerge bûm, dema şer dest pê kir, me çek hilgirt da ku em parastina deverên xwe bikin, lê ji ber kêşeyên siyasî li Rojavayê Kurdistanê, ji neçarî ez hatim Başûrê Kurdistanê û tevî hêza Pêşmergeyên Roj bûm." Berdewam dike û dibêje: "Ez di gelek şeran de beşdarbûm, dema Hêza Şeibî êrîşî axa pîroz a Kurdistanê kirin, ez li gel hejmarek ji hevalên xwe yên Pêşmerge dil hatim girtin, alaya Kurdistanê li gel min bû, yek ji çeteyên Heşidê alaya Kurdistanê bînpê kir, min ala hilgirt û danî ser serê xwe, hindik mabû ku min bikikujin, lê dema Artêşa Niştimanî ya Iraqê gihşt deverê em serbest hatin berdan, serbestberdana me jî, bi sedema guhertina dîlan di navbera Pêşmerge û dîlên Heşida Şeibî de bû." Derbarê karên xwe yê bê beranber ji bo welatîyên xwe dibêje: "Ez Pêşmerge me, li malê, li senger li kuderê be erkê Pêşmerge ew e ku welatîyên vî welatî bi dîlşadî û aramî bijîn, ji ber vê ez amade me ji bo her kesî kar bikim û bê beramber, da xweşiyê têxim dilê welatîyên welatê xwe." Enwer xelkê Efrîna Rojavayê Kurdistanê ye, temenê xwe 39 sal e, xwedan 5 zarok e. ji malbateke welatparêz li ser rêbaza wefadariyê û vîna bo gel û axa welatê xwe, rêbaza Barzanî ya pîroz xebat kiriye. Awata Enwer wek ew tîne ziman bi axaftin û xebata xwe, ew e ku ew di welatê xwe serberz û azad bijî, li axa pîroz ya Rojavayê Kurdistanê û bitaybet li ser axa Efrîna .birîndar

